Biryara (dadgeha destûrî) roniya dil û mêjiyê kurdan tarî nake.

Mihemed ELÎ

efrin2612@hotmail.com

Biryara ku (dadgeha destûrî li Tirkiyê) roja înê 11.12.2009 derxist û pê partiya DTP girt, biryareke durû û reqezperest e. Ev biryar xelekeke berdewam ji xelekên tepisandina dengê gelê Kurd e! Helwesta Tirkan jî li dijî gelê Kurd helwesteke seyr û bêgane ye, ji roja ku ew hatine rojhilata navîn ew dijmantiya Kurdan dikin. Ji hingê ve ew amade ne hevkariya herkesî, ji bo xatirê qirkirina gelê Kurd, bikin, tevî ku Kurdan her û her camêrî bi wan re kirine, lê *nanê Tirkan li kabê ye*!! Misliman, çep, rast, jor, jêr… hemû rengên siyaseta Tirkan li dijî Kurdan in!

Tiştê ku roja înê jî qewimî di heman çarçiweyê de ye. Girtina DTP ne wek ku Tirk angaşt dikin ji ber ku DTP alîgirê PKK'ê ye û bûye kosp di rêya çareseriya gelê Kurd de. Ja rast ew e, ku DTP dengê holman û wîjdana gelê Kurd e, wîjdana ku dewleta Tirko dixwaze li gorî dilê xwe şêwaz bike û ji Ewopiyan re bêje 'vaye min pirsgirêka Kurdan çareser kir, êdî deriyê xwe ji min re vekin, êdî ez li ber deriyê we perîşan bûme û nîşanên kiryarên min bi hevyaza (tercîha) we bi hemû gelên vê dewletê (Tirkiyê) kirine, derdikevin holê û dê min û we ve riswa bikin'.

Behaneya biryara girtina DTP ew e, ku DTP û PKK derftên çareserkirina pirgirêka Kurd li tirkiyê asteng dikin! Kesên ku heyîna gelê Kurd nepejirînin ji xwe napejirînin, lê kesên ku ji ber sedemên min li jor gotine vê heyînê wek daqurtandina jehrê dipejirînin jî, dibêjin, ku DTP û PKK ne nûner û berdevkên gelê Kurd in. Ew bi angaşta xwe de pê de diçin û dibêjin ku, ne ji wan bûya, pirsgirêka Kurd ê ji zû ve çareser bûbûya!! Gelo ev çend sal in PKK dest avêtiye çekan û derketiye serê çiyayên Kurdistanê ji bo heyîn û rûmeta gelê Kurd biparêze? Ev çend sal in derfetên wisa nefsbiçûk di bin sîwana çavdêriya teng a dewlta Tirko de ji Kurdan re peyda bûne, heya dengê xwe ji bo nizimtirîn mafên Kurdan bi rêya partiyên siyasî bilind bikin?

Ev 80 sal in dewleta Tirko gelê Kurd bênavber dikuje, koç dike û rûmeta wî bin pê dike. Berî PKK û DTP çend bizavên mitmane û jidil ji hêla tirkan ve sebaret bi çareserkirina pirsgirêka gelê Kurd derketine holê? Ew neheqiya ku dewleta kor li dijî Kurdan bi cih danî û bi hezaran ciwanên Kurd kuştin, gundên Kurdan şewandin û kavil kirin û best û zozanên wan mezixandin, îro ji xwe re li rûyekî zagonî û bêperwa digere. Îro serokê dewleta Tirko (ku jixwe felsefeya partiya wî ji Îslametiya tirkan tê) dibêje ,her kes divê rêz ji biryara dadgehê re bigire'! Gelo ev neheqî û zînata ji kesekî xwedî bilindtirîn diyarok di dewleta tirkan de derkeve holê, gelê Kurd ê bi çi rengî baweriya xwe bi hemû pergala vê dewletê bîne?

Îro bi fermana generalên ku di nizimtirîn rêza Masoniyan de ne û hemû mofirkên jiyanê di dewleta tirko de di destên wan de ne, biryara girtina DTP derket û vaye def û niqarên şer ji nû ve lêdikevin. Ev kesên navborî û salarên wan di rêzên bilind ên Masoniyê de ji ber arîşeya aborî li cîhanê dinalin û pêwîsîtî bi firotina çekan heye, çek jî dîsa şeran dixwazin, şer jî bi van biryarên bêdad û sorbar derdikevin holê… Gelê Kurd jî bi dehan caran gotiye em şer naxwazin, daxwaza me aşitî, azadî û biratî ye, lê dema ku em têkevin eniya xweparatina rewa em jî dikarin êdî li gorî reftarên dijmin bersivê bidin…

Reng e (dadgeha destûrî li Tirkiyê) dengê partiyekî Kurdan ji hêla siyasî ve birî, lê gelo kî dê bikaribe dil û mêjiyê Kurdan, ku bi tîşkên azadî û şiyarbûnê ronê bûne ji nû ve kor bike??